Pişteva nî Bi Mihyedîn Şêx Alî re

Apê Osnebir

Weke xwendevanên Newroza me berê xweş zanin , ku me (Apê Osnebir) ji mêj ve û ji ber hin sedemên ne pêwîste ku em nûha diyar bikin , me dest ji nivîsandinê berdaye. Berê xwe daye rengine dî ji xebatê . Bêguman vaye derebasî heftsaliyê dibe , ku em ji pir xwendin û hindik nivîsandinê bi dûr ketine.

Ji berî ku em dest bi kurtegotara xwe dikin , hêja ye ku em bi bîra xwe û xwendevanan bînin û patekê ji mamostê hêja , D . Dilşad Sindî (D. Ebdilmecîd Şêxo) re bidin , silavên germ lêbikin û di guhên her mamostekî hêja de bi dengekî bilind bêjin : Her û herbijî mamostê hêja! Yên weke we(D. Ebdilmecîd jî yekek ji wan) , em û hevriyên me , di sih û sira we de gelî mamostan ! Hoyî tîp , xwendin û rastnivîsandina bi zimanê Kurdî (Kurmancî) bûne . Niha jî, serên me bi yên mîna we gelekî bilind e .

Dîsan û careke dî , berî ku em dest bi kurtemijara xwe dikin ;çênabe em diyar nekin ku , hevriyên me di sih û sira rêvebirê hêja , Mihyedîn Şêx Alî sekretêrê parta me ,Partiya Yekîtî ya demoqrat a Kurd li Sûriyê(YEKÎTÎ) de, em hînî hûnan û vereşandina tîpên rêzaniyê bûne û hê jî dibine. Em kumê xwe , ji yên weke we re dihejînin û dibêjin : Roj Baş hevalino !.

Girtina Mihyedîn Şêx Alî:

Li katijmêr 19an, roja 20/12/2006an , xebatarê pîdar Mihyedîn Şêx Alî, sekreterê partiya yekîtî ya demoqrat a Kurd li Sûriyê [YEKÎTÎ], li çayxana NEXÎL li Helebê , ji hêla ewlekariya leşkerî ve hate girtin û ew bi cihekî ne naskirî ve birin , ta niha ew azad nebûye û ne jî pêşkêsî tu dadegehan bûye .

Pişteva nî Bi Şêx Alî re

Evên jêrîn hin ji partî , rêxistin , dezgeh fereziyetên navdar …H.W.D, yên pişteva nî bi birêz Mihyedîn Şêx Alî re kirine:

1-Komîta rêzanî Ya Partiya Yekîtî Ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (Daxuyanî).

2- Komîta rêvebir ya partiya yekîtî ya demoqrat a Kurd li Sûriyê (Daxuyanî).

3-Rêxistina Ewropa ya Partiya Yekîtî Ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê(Daxuyanî)

4-Ji rêxistnên parta yekîtî ya demoqrat a Kurd li Suriyê-YEKÎTÎ-(Daxuyanî):

- Rêxistina partiyê li Dêrîkê.
-Rêxistina partiyê li Remêlan.
- Rêxistina partiyê li Tirbe-Sipiyê.
- Rêxistina partiyê li Qamişlo.
- Rêxistina partiyê li Amûdê.
- Rêxistina partiyê li Dirbêsiyê.
-Rêxistina partiyê li Serê Kaniyê.
- Rêxistina partiyê li Husiça .

5- Rêxistinên Partiya Yekîtî Ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê,li navça Efrînê –Çiyayê Kurmênc.